Destûra Wezareta Zarok, Xort, Malbat, Beranberî, Koçberî û Entegrasyonê (MKJFGFI) derbarê Naskirina Heqê Îqametê – Pêveka 3an
Têkiliya digel Xala 1.6 a destûrkarên bikaranînê

---

Bijarde ji bo nimûneya têkildarî raberkirina danezana pabendiyê

Li gorî destûrkarên biakranîna demkî ya têkildarî Hejmara 1ê, Hevoka 1ê, Paragrafa 1ê ya Xala 10an a Qanûna Welatîbûnê (StAG)

Ragihandina Pabendiya li Pergala Bingehîn a Demokratîk a Azad:

*„1. Ez pabendiya xwe li Pergala Bingehîn a Demokratîk a Azad a Qanûna Bingehîn a Komara Almanyayê ya Federal radigihînim. Bi taybet ez rêzê li babetên xwarê digirim:*

*a) Mafê gel ji bo sepandina desthilata hikûmetê di hilbijartin û dengwergirtinan da û bi rêya saziyên taybetî Saziya Qanûndarêştin, Saziya Cihêner (hikûmet) û Saziya Dadweriyê û bijartina nnerên gel di hilbijartina gelemperî, rasterast, azad, beranber û nihênî da,*

*b) Pêwîstdarkirina qanûndarêştinê bo rêzikan li gorî Qanûna Bingehîn û neçarkirina Saziya Cihêner (hikûmet) û Dadweriyê bo berçavgirtina qanûn û mafan,*

*c) Mafê bidestxistina perwerdehîyê û sepandina dijayetiya parlimanî,*

*d) Derfeta wêdadayîna hikûmetê û berpirsyariya wê derheq nûnerên gel,*

*e) Serxwebûna dadgehan,*

*f) Nepejirandina her cûre serdestîya tundûtûjî û zorbêjiyê,*

*g) Mafên mirovan ên destnîşanirî di Qanûna Bingehîn da*

*h) Ev mijar ku kiryara ku armancên dijayetiya hemberî cihûyan, nijadperestî, dijayetiya hemberî biyaniyan an armancên din ên dijî cîgeha mirovahiyê bişopîne, li dijî cîgeh û beranberiya hemî kesan e ku ji aliyê Qanûna Bingehîn va hatiye misogerkirin û li dijî vê Danezana Pabendiyê ye.*

*2. Ez radigihînim ku pişta wan hewldanan nagirim an min negitiye, her wiha wan hewldanan naşopînim û min neşopandiye ku*

*a) Berovajî Pergala Bingehîn a Demokratîk a Azad, hebûn an ewlehiya dewleta federal an eyaletekê ne an jî*

*b) Zirareke neqanûnî di pêkanîna erkên saziyên Qanûna Bingehîn ên Dewleta federal an eyaletekê*

*an endamên wan berçav digirin an jî*

c) *Bi rêya sepandina tundûtûjî an kiryarên wê yên seretayî berjewendiyên derveyî yên Komara Almanyayê ya federal dixin ber xeterê an jî*

d) *Kiryareke dijî cihûyan, nijadperestane, dijayetiya digel biyaniyan an kiryareke din a binpêkera cîgeha însanî berçav digirin."*